Suspension factsheet: supporting your child's wellbeing

Parent/carer information

# Belgeya seknanadinê: Piştgiriya başbûna zarokê xwe bikin

## Agahiyên dê û bav/çavdêran

### Çawa piştgiriya zarokê xwe bikin

Cihekî baş yê destpêkirina dema piştgirîkirina tenduristî û bextewariya zarokê we di dema seknandinê de berhevkirina agahdarî û şîretên pispora ne. Ji bo şîret û agahdariya pratîk ji bo piştgirîkirina başbûna zarokê xwe van çavkaniyên di vê rupelê de bişopînin:

- Bextewarî (Wellbeing)

Têkiliya erênî û vekirî ya di navbera mal û xwendegehê de ji xwendekaran re dibe alîkar ku şansê serfiraziyê çêtirîn peyda bike.

- Zarokê xwe piştrast bikin ku ew endamekî girîng yê civata xwendgehê ye.
- Xemên xwe ragihînin xwendegehê.
- Bi tîmê xwendegehê re bi hevkarî karbikin da ku stratîjiyên ku piştgirîya beşdarbûna zarokê we di fêrbûnê de dikin pêşve bibin û bicîh bînin.
- Beşdarî civîna plansaziya vegera zarokê xwe bibin. Dibe ku ev rû bi rû, serhêl yan bi têlefonê be.
- Bi zarokê xwe re li ser reftarên guncav yên ku hawîrdorên fêrbûnê yên erênî, ewledar, berfireh û rêzdar bipeyivin.
- Zarokê xwe teşwîq bikin ku bi rêzdarî fikir û ramanên xwe parve bikin.

### Fêrbûna ji mal di dema seknandinê de

- Endamekî karmend dê di dema seknandinê de bi rêkûpêk bi we û zarokê we re têkiliyê deynin.
- Bi danîna demên zelal ji bo demên kar yên di nav rojê de, peydakirina cîhekî bêdeng, û bipirsin ka fêrbûna wan çawa pêşve diçe, alîkariya zarokê xwe bikin ku fêr bibe.
- Piştrast bikin ku brêkê wan hebin, avê vexwin û ger strês û xem çê bibin piştgirî bidin wan.
- Ji bo çalakiya laşî demê bidin.
- Çavdêriya zarokê xwe bikin ku teknolojiyê bi ewlehî bikar bîne. Malpera Bikaranîna Teknolojiyê (Using technology) agahdarî û çavkaniyên ku hûn dikarin bikêr bibin hene.

### Girêdanên Alîkar

- Pakêtên fêrbûnê (Learning packages)
- Şêwirmendiya fêrbûn û piştgirîkirina astengdaran (Disability learning and support advice)
- Amûrên desteka reftarê: Piştgiriya ji bo dêûbavan (Behaviour support toolkit: support for parents)
- Alîkariya zarokê xwe ji mal fêr bibe bike (Helping your child learn from home)
- Xeta Alîkariya Zarokan (Kids Helpline) yekane xizmeta şêwirmendiya têlefonî ya belaş e li Australya ji bo kesên 5 heta 25 salî. Telefone 1800 55 1800 bikin.

### Xizmeta wergerandina telefonî

Heke hûn dixwazin bi xwendegehê re têkiliyê daynin û ji bo Îngilîzî hewcedariya we bi alîkariyê heye, ji kerema xwe telefone xizmeta wergêriyê 131 450 bikin, ji wan re bêjin hûn çi zimanî diaxafin û ji operator bixwazin ku telefone xwendegehê bike. Operator dê wergêr li ser xetê peyda bike da ku alîkariya we bike. Ev xizmet bê pereye.